

Jîn


Êk ji cejinê mezî li Emrîke “Cejina Rabîna ‘Îsayê Mesîh” e. Hîkmeta Emrîke îcaze ji şulê hey, dêr program u stran yê teybet yê heyn, u miruv diçin mala êk u dû bu şîvek xuş.

Li hemandem, wek Cejina Deykbîna ‘Îsaî, Cejina Rabîna ‘Îsaî bî demê çûna sîkê u demê kîrînê. Gelek Emrîkî mebesta rast ya Cejina Rabîna ‘Îsaî nizanin. Mebesta wê kêvirîşk u hêk u çiklêt u cilket nî u pêlavêt nî nîne. Belê, mebesta wê ‘Îsa ye, u ‘Îsa yê Rizgarker yê dinyayê.

Bîne bîra xu – çîroka heyva çûî – pêxember Musa Cihî ji destê Fir’ewnî xilas kirin. Demê Musaî u Cihîa berxa qurban kirin u xwîna berxa ser dûmelbena u serdera malêt wan, Xudanî xwîn dît u “derbaz bî” malêt wan u ne çû jur ve malêt wan u



kurrêt wan yê nexirî ne kuşt. U ji ber hindê navê cejinê “Derbazbîn” e. Navê wî berxe ku qurban kirî (u xwarî) “Bexê Derbazbînê” bî.



Yuñenna pêxember ji berî ‘Îsaî bî. Wî beñsa ‘Îsaî u gute xelkê, “Ew Bexê Xwidê ye. Ewê guneha dinyayê radikit.”

Cejina Rabîna ‘Îsayê Mesîhî tamamkirnê Cejina Derbazbînê çunku ‘Îsa – miruvek tamam u ne gunehbar – bî Bexê Derbazbînê, qurbane bu hêmî dinyayê. Tu dişêî çîroka rast ya Cejina Rabîna ‘Îsayê Mesîhî li pera 3 bixwînî.

Buçî Cejina Rabîna ‘Îsayê Mesîhî gring e? Gring e çunku mirin u veşartin u rabîna ‘Îsayê Mesîhî binyat e Incîlê li ser avakirî ye. Buçî? Dû mebest in:

(1) Heker ‘Îsa – bexê qurbanê tamam bu gunnehêt me - ne mir, ye'nî hêsta me da qurbanê gînewera kirî ban. Xwîna ga u berxa gunnehêt xelkî nabit. Çunku Xwidê gut xelkê qurbana gînewera bike, belê ji ber bawerîa miruva u ta'eta Xwidê, Xwidê gunnehêt wan burandin. Belê xwîna qurbanekê tamam – ya miruvek ne gunehbar bî – gunnehêt me dibit heker em qebîl bikîn. Ew miruvê bê gunneh ‘Îsa ye. U heker em bawerîe bi ‘Îsaî bînîn, belê dê gunnehêt me burit u dê bu me jîana her u her bit.

(2) Heker ‘Îsa piştî mirnê ne rabî ba, belê Filehatî da bit tamam wek hêmî dînê dî – pêxemberê wan yê mezî mirî ne. Belê bi şîanê Xwidê, ‘Îsa ji mirnê li roja sîe rabî u evroke sax e!

Qurtalkirin ji gunnehêt me wek dîarî ye. Heker tu dîarîekê bidî min u heker ez venakim u qebîl nakim, ye'nî çawa bu min baş e? Ez nizanim ew çî ye u keyfa min naêt. Belê, heker ez dîarîa te vedikim u qebîl dikim, ya min e. Dîarîa Xwidê bu me jî wek êk e. Dîarîa Xwidê bu me xilaskirin ji gunnehêt me ye. Xwidê ev dîarîe daî ye me bi rêka qurbankirna ‘Îsaî li ser xaçê – ew Bexê Derbazbînê tamam. Heta em dîarîe qebîl ne kîn, nabit ya me.

Cejina Rabîna ‘Îsayê Mesîhî pîruz bit!

Azadîa rastî çî ye?

Heker welatek azad e, azadî didit hevvelatîa xu bi axiftinê u nivîsandinê u kumbînê u dînî.

Azadîa axiftinê u azadîa nivîsandinê maf yê hey da behsa miruvêt dî bi qencîe yan bi xirabî bit ... u maf jî heye da behsa seruka wek reîsê Emrike bi rexnegirî bikin. Çunku bi tinê desthelatdraî ji def Xwidê ye, pêtivî ye em qedirê serukêt xu bigirîn demê em diaxivîn u dinivîsîn. Azadî ne azadî ye heker miruv rêka rast ne çit.

Azadîa kumbînê maf yê hey da hêfleke çekin, yan şulek yan derekê nî vekin, yan li gel miruvêt dî diçin mektebekê da tiştekan yan miruvek bêzarî bikin.

Azadîa dînê maf yê hey da miruv ‘îbadetê Xwidê dîkin wek bi xu divên u dînê xu diguhurrin dînek nî heker divêt – bê tirsandina êşandinê yan kuştinê.

Fêrkirna rastîe derbarê Xwidê dikevite stuê serukêt dînê da. Ew seruke destheldar bi kumela xu ne çunku ew nîşa miruv dîkin Xwidê kî ye. Belê miruv ji axiftina wan bawer dîkin çunku seruk mamosta ne u ewan miruva kitêb dixwandîne.

Tu dê xwînî li çîrokê li perê 3, serukêt dînê ‘Îsa girt u dadkir u kuşt. Kerrê wî jê ve îna çunku wî dîrîet wan dîar kir. Serukêt dînê gut miruva, “Husa bijîn!” belê bi dîv axiftina xu ne ketin. Xwidê kerrê dîrîatîe jê ve dibit!

Xwidê desthelatî daî serukêt dînê wek yê pêxember Musa. (Rast e, Xwidê li gel Musai axift u Musai gut xelkê Xwidê çî digut.) U miruv zanî pêtivî ye

pîa fêrkirna wan dîkin. Belê heker serukêt dînê rastîe Xwidê nîşa miruva nakin ... yan heker nîşa rastîe dîkin u pîa axiftina xu nakin ... paşî dê kêşe hebin.

Ji berî serukêt dînê ‘Îsa girtin, wî eve gut wan:

Nexwizîkêt we, ey mamostayêt desturî u ferîsîya, ey dîrînû! Çunku hîn heta dehkêt ne’ne’ u sibit u riha zer didin, belê tiştê gring di desturî da hîn lad din: dadperwerî u diluvanî u dilsuzî. Ewa pêdivî ewe, we her dû bi cih îna ban. Gelî serkêşê kure, hîn ava xu ji pêşîe paqij dîkin, belê hîn hêştirê dadîrin.

Nexwizîkêt we, ey mamostayêt desturî u ferîsîa, ey dîrînû! Çunku hîn perdaşê u sênîkê ji der ve dişun, belê ji nav da ya pire ji talan u serberdayê. Ey ferîsê kure! Tu li pêşîe perdaşê ji nav da paqij bike daku ji der ve jî paqij bibit.
- Mizgînîa Mettî 23:23-26

U demê azadîa we ya sîasetê mezin dibit, hişîar bibin hîn fêrkirin yê rast u nedûrî derbarê Xwidê bidin hevvelatîet we. Bihêlin hevvelatî bi xu hîlbijêrin çawa dê ‘îbadetê Xwidê dîkin. Şulê her êkê ye – u ne şulê hemî welat u hikmetê ye – da hîlbijêrin pîa rastî ve dibin. Bab bu biçîkêt xu ne şên brîardanê bigirin. U husa serukêt dînê ne şên ew brîardanê bu miruvêt dî bigirin.

Bigire rêkê xirabkarî, ewe bi rex ‘Îsaî ve ser xaçê hilawîstî. Ji ber mir, wî rastî hîlbijart. Jîan hîlbijart. Azadî hîlbijart.

Çunku nanê Xwidê ewe yê ji esmanî dête xwarê u jîanê didite dinyayê. ... Ez im nanê jîanê. Ewê pêş min ve bêt bîrsî nabit, u ewê bawerîe bi min bînit çî cara têhnî nabit. - ‘Îsa

Cejina Rabîna ‘Îsayê Mesîh


Bê Bextî ya Yehudaî

U cejina Nanê Şikeva nêzik bî yaku dibêjinê Cejina Derbazbînê. U hêştâ serukêt qeşa u mamostayêt desturî hewil didan ‘Îsaî bikujin çunku tirsâ wan ji milletî bî. Iblîs çû dinav leşê Yehudaî da, yê ku digûtinê “Esxerîutî” u yê ku êk bî ji dwazde şagirda. Yehuda çû u digel serukêt qeşa u pasewanêt peristgehê axivit ka dê çawa ‘Îsaî dite destê wana. Îna keyfa wan hat u birrîar dan hindêk para bidinê. Ew jî razî bî bi wê çendê u berê xu dida delîvekê da ku ‘Îsa dûrî xelkî bidite destê wan.

Şîva Dumahîkê

U Roja Derbazbînê hat yaku divîan berxê Derbazbînê têda ser jê kin. Îna Petrus u Yuhenna virêkirin u gut, “Herrin u bu me xwarina Derbazbînê amade bikin daku em bixwîn.” Pisîar jê kirin, “Te divêt em li kîrê amade bikîn?” Wî gute wan, “Demê hîn diçine nav bajêrî, dê miruvekî cerê avê li ser milî bînin, hîn bigehinê heta mala diçitê, hîn bêjine xudanê wê malê, <Bêjite te jura mêhvana li kîve ye yaku ez Şîva Derbazbînê digel şagirdêtu têda bixwin?> Ew dê jurekê li texa dûê nîşa we dit, jureka mezine u raexstî ye. Hîn dê li wêrê amade kin.” Ew derketin u

çûn u ew tişt dîtin yê ‘Îsaî guti ye wan. U nanê Derbazbînê amade kirin.



Demê bî ye wexit, ew u hinartî digel êk rîniştin u gute wan, “Dilê min gelek diçûyê ez vê cejina Derbazbînê digel we bixwim berî ez bême êşandin. Ez dibêjime we, çunku ez êdî naxwim heta paşayeti ya Xwidê bi cih ne êt.” U perdaşek şerabê helgirt u supasîa Xwidê kir u gut, “Vê perdaşê bigirin u dinavbera xu da parvekin. Çunku ez dibêjime we êdî ez ji berhemê dara tirî naxwim heta paşayeti ya Xwidê ne êtin.” U nan helgirt u supasîa Xwidê kir, şikand u da wan u gut, “Eve leşê min e yê ku diber we da diête dan. Hîn vê ji ber bîrhatina min bikin.” U herwesa perdaş piştî şîvê helgirt u gut, “Ev perdaşê peymanî nî ye bi xwîna min yaku ji ber we diête riştin. U li ser sifirê destê wî kesî digel min e ewê min bidit destê neyara. U divêt Kurrê Miruv bi wî rengî biçit yê ku bu hati ye danan. Belê mixabinîa wî kesî yê wî bidite destê neyara.” Îna pirsîara êk u

dû kirin: tu bêjî kî ji wane vê çendê bikit.


U paşî weku hercar çû Çîayê Zeytûn u şagirdêtu wî bi dîv ketin. U demê gehiştinê, gute wan, “Nivêja bikin daku hîn ne kevine di taqîkirna da.” U nêzikî diratîa ber havêjekî ji wan dîr ket u çukêt xu danan u nivêj kir u gut, “Ey Babû, heker çê bit tu vê perdaşê ji min dîr bêxe. Belê bila hêza te bit, ne hêza min.” U firîşteyek ji esmana lê der ket u peyt kir. Li vêrê ‘Îsaî milmilanê dikir u bi



germî nivêj dikir, xuhdana wî weku xwîne dikete erdî. U paşî nivêj berda u hate def şagirda, berê xu dayê ji xema nivistîn. Îna gute wan, “We çî ye, hîn nivistîn? Rabin nivêja bikin, da hîn ne kevine di taqîkirin.”

Girtina ‘Îsaî

Demê hêş diaxivit, revdeka miruva hat u yê ku dibêjinê Yehuda li pêşîa wan bî. Ew jî êk ji wan dwazde şagirdan bî. Îna bi pêş ‘Îsaî ve hat daku maçî bikit.



‘Îsaî gutê, “Ey Yehuda, tu bi maçê Kurrê Miruv didî destê neyara?” Demê şagirdê ‘Îsaî zanîn dê çi rîdit, gutin, “Ey Xudan, em şîrî veweşînîn?” U êk ji wan şîr veweşand kuîlê serukê qeşa u guhê wî yê rastê birrî. ‘Îsaî gut, “Li vê çendê rawestin.” U dest havête guhê wî u sax kir. U ‘Îsaî gut serukê qeşa u pasewanê peristgehê u rihspîa, ewêt ku hafînê, “Erê hîn min weku dizekî dibînîn, hîn husa bi dar u şîrve hafîne min? Demê ez her ro li peristgehê li def we, we destê xu drêjî min ne kir. Belê eve delîva we ye u desthelatîa vê gavê bu tarîê ye.”


‘Îsa girtin u birin heta krîne dikuçka u serukê qeşa ve. U ew zelamê zîrevanî li ‘Îsaî dikirin, tirane pê dikirin u lê didan. U rî wî dinxamitin u pisîar jê dikirin, “Pêxemberatîe bike, kî bî li te daî?” U gelek axftinê kirê digutinê.

U demê roj derketî, civata rihspîet milletî kumbîn, yaku ji serukê qeşa u mamostayê desturî pêkhatî. U birin pêşîa civata xu u gutin, “Heker tu Mesîh bî, bêje me.” Îna gute wan, “Heker ez bêjime we hîn bawer ji min nakin, u heker ez pisîarê ji we bikim, hîn bersiva min nadin. Belê Kurrê Miruv ji nuke pêve dê li destê rastê ye şîana

Xwidê rîniştî bit.” Îna hemîa gutin, “Anku tu Kurrê Xwidê î?” ‘Îsaî gute wan, “Ewê we gutî ez ew im.” Îna gutin, “Ma me çi pêdivî bi şahda heye? Eve me ji devê wî bi xu guh lê bî.”

Birina ‘Îsaî def Pîlatisî

U paşî civata wan hemî rabîn u ‘Îsa birine def Pîlatisî. U dest bi gunnehbarkirna wî kirin u gutin,



“Bu me dîar bî eve milletê me di serda dibit u nahêlit xuêk bu qeyserî bête danê. U dibêjit ez Mesîhê paşa me.” Îna Pîlatisî pisîar jê kir, “Tu î paşayê Cihîa?” ‘Îsaî bersiva wî da, “Te bi xu gut.” Paşî Pîlatisî gute serukê qeşa u civata li wêrê, “Ez çi gunneha ji vî miruvî nabînim.” Belê wan gunnebartir kirin u gutin, “Ew milletê li hemî Yehudîe hand dit, her ji Celîl u heta vêrê xelkê fêr dicit.”

Dadkirna ‘Îsaî bi Mirnê

Pîlatisî daxwaza serukê qeşa u seruka u milletî kir u gute wan, “We ev miruve îna ye def min ku milletî di serda dibit, u rêkê li wan berze dicit. Piştî min di hâzîrbîna we da baş berê xu dayê, bu min dîar bî ku çi gunneha vî miruvî nîne ku hîn gunnebar dicit. Vêca ewî çi tiştê wesa ne kirî ye ku hejî

mirnê bit. Ez dê qamcî dim u dê ber dim.”

Belê hemîa gazî kir, “Evî bikuje u bu me Barabasî ber de!” U ev Barabase ji ber têkve dan li bajêrê u kuştinê hat bî zîndan kirin. Dûbare Pîlatisî gut u divîa ‘Îsaî azad bikit. Ewan pêk ve kirin gazî, “Xaç bide! xaç bide!” Îna cara sîe Pisîara wan kir, “Vî çi gunneh kir ye? Ez çi gunneha wî nabînim ku hejî mirnê bit. Vêca ez dê qamcî dim u azad kim.” Belê ewan bi tundî u bi dengê bilind gazî kirin u xwastina xaçdana wî kirin. U dengê wan bi ser dengê wî kit. U Pîlatisî ferman da u daxwaza wan bi cih îna. U ewê li ser têkvedan u kuştinê hatî girtin, li ser daxwaza wan azad kir. Belê ‘Îsa êxiste jêr birîara wan.

‘Îsa li ser Xaçê

Demê ewan ‘Îsa bu xaçdanê dibirin zelamek xelkê Qeyrewanê girtin, di gutinê Sim’an, ew zelame ji çemî vedigerîa u xaç danan ser milê wî daku li dîv ‘Îsaî helgirt. U gelek xelk ketbîne dîv wan digel hindek jina bu digirîn u li xu didan. Îna ‘Îsa li wan zivirî u gut, “Ey kiçê Urşelîmê, bu min ne girîn, belê bi xu u biçîkê xu bigirîn. Ha dê hindek roj ên xelkê dê bêjin: xinêka jinê bê ber ewêt bi tiştê ne ketîn u singê wana şîr ne daî ne kesê. Hingê dê bêjine çîa bi ser me da bi herfin u bêjine gira me bi nixêmin. Vêca heker husa bi çeqê kesik vekin, pa dê xalê çeqê hişkê çawa bit?”


U dû gunnebar jî digel ‘Îsaî bu

xaçkirmê birin. U demî gehîştîne wî cihê dibêjinê Kilux, ew digel dû gunnehbara xaç dan. Êk ji wan li ser destê wî yê rastê u yê dî li destê çepê. U ‘Îsaî gut, “Ey Babê min, li wan bibure çunku ew nizanin ka çi dikin.” U cilkê wî bi pişkê li xu li kîve kirin. U millet li wêrê rawesta bî u berê xu didanê u her wesa seruka deqîş lê didan u digutin, “Xelk qurtal kirin, dê bila xu qurtal bikit heker rast Mesîhê li def Xwidê hilibijartî ye.” U her wesa serbaza jî tirane pê dikirin. U sihik pêşkêş dikirin u digutin, “Heker tu paşayê Cihîa î, xu qurtal bike.” U parçe depek li ser serê wî helawîst bîn, u ev çende li ser nivîsî bî, “Eve ye paşayê Cihîa”.

U êk ji wan her dû gunnehbara axiftinê ne drêda gutinê, u gut, “Ma tu ne Mesîhî î? Pa dê xu u me jî qurtal bike.” Belê yê dî paşvebir u gutê, “Tu di wî ka u danî da u ji Xwidê natirsî? Hindî sizayê me ye, sizayekî rast e. Çunku em yê sizayê kirîara xu bi rastî distînin. Belê vî miruvî çî tiştê ne di cihê Xuda ne kirî ye.” U paşî gut, “Ey ‘Îsa, min bîne bîra xu demê tu diçî ye paşayetîa xu da.” ‘Îsaî gutê, “Bi rastî ez dibêjime te, tu dê evru digel min li fîrdewsê bî.”

Mirna ‘Îsaî

U nêzikî se’et şeş (dwazdeî nîvro) u heta se’et neh (sîe piştî nîvro) tarî kete hemî erdî, u tav reş bî u perda peristgehê di nivêra ker bî. ‘Îsaî bi dengekî bilind gazî kir, “Ey Babê min, ez ruha xu didime destê te.” U piştî we gutî ruhî ji dest da.



U demê serpelî ev tişte dîtî, pesna Xwidê kir u gut, “Bi rastî eve miruvê henê yê rast bî.” U her wesa ew kesê hatî ne xaçdanê bibînin, demê ew tişte dîtî, danane singêtu xu. Belê hemî nîasêtu wî u digel wan jina ewêtu ji celîk digel hatî. Ji dîr ve rawesta bîn u berê xu di daneser u berê xaçdanê.

Veşartina ‘Îsaî

U miruvek ji civata rihspîet milletî hebî, navê wî Yusiv bî, miruvekê baş u rast bî. Ew digel birrîara civatê u kirîara wan ne bî. Ev miruve ji xelkê bajêrê Cihîa Ramê bî. U ew jî êk ji wan kesa bî yê çaverrêa paşayetî ya Xwidê dikirin. Ev miruve çû def Pîlatisî u termê ‘Îsaî jê xwast. U paşî ji xaçê îna xwarê u kitan lê aland u ber gurrê di textê da kulaî da veşart, ew gure kesek têda ne hat bî veşartin. Ew roje roja amadekirna Roja Şembîê bî, ya ku nêzik dibî u ew jinêtu ji Celîl digel ‘Îsaî hatî, ketine dîv Yusivî u gur u seruberê veşartina wî dîtî. U paşî vegerane ve, u dermanêtu bêhin xuşîe u çewirkinê amadekirin. U Roja Şembîê li dîv desturî bêhina xu vedan.

Saxbîna ‘Îsaî

Roja êkê ji heftîe, hêsta zî ew jinik çûne ser gurrê u derman u bêhina xuş ya ku ji berî hingê amadekirî, digel xu birin. Berê xu danê ew berê di derê gurrê da yê hatî ye girêlkin, belê demê çûne jur, termê ‘Îsayê Xudan ne dîtî. U guhişî man, u di wî demî da berê xu danê dû zelam bi cilêtu çîrsî ve li tenîşt wan dirawestaî ne. U tîrsê ew girtî u berê xu dane ber pêtu xu, îna her dû zelam gute wan, “Hîn



buçî li nav mirîa li saxa digerrin? Ew ne li vêrê ye, belê yê rabî! Bînine bîra xu demê hêş li Celîl gutî ye we gut bî: Divêtu Kurrê Miruv bi destê hindeka bikevite destê gunnehkara, u bêt xaçdan u roja sîe rabit. Axiftina wî hate bîra wan u ji ser gurrê vegerrane ve u ew hemî dengubase bê kêmatî gehandine her yazde şagirda u xelkê dî. U ew jinêtu ew dengubase gehandî ne hinartîa eve bîn: Merîema Mecdelî u Yunna u Merîema deyka Ye’qubî bîn, u digel hindek jinêtu dî ewêtu digel wan çûn. Belê axiftina wan li def hinartîa weku axiftina miruvekê bê huş bî bawerî bi wan ne îna. Belê Petrusî kire xar u çû ser gurrê. U demê xu çemandî ye hindav gurrê. Bi tinê patêtu pêçaî dîtî u ji wê rîdanê guhişî ma u çû.

Di Rêka ‘Imuas da

U her wê rojê dû şagird diçûne gundekê, dibêjinê ‘Imuas, ev gunde nêzikî heft mîla ji Urşelîmê dîr bî. U li ser hemî rîdanêt peyda bîn diaxiftin. U demê ew diaxiftin u dan u standin dikirin, ‘Îsa nêzikî wan bî u digel wan bi rê çû. Belê çavêt wan hatine perde kirin u ne nîaşîn. U pisîar ji wan kir, “Hîn diçûna xu da liser çi diaxivin?” Îna rawestan u mirîtu bîn, u êk ji wan bersiv da, navê wî Kilûbas bî, u gutê, “Erê, ma tu bi tinê li Urşelîmê bîanî u tu nizanî ka li Urşelîmê çi rîda ye?” Îna gut, “Çi çê bî ye?” “Gutin ewa bi serê ‘Îsayê Nasirî hatî ew pêxemberê beramberî Xwidê u hemî milletî yê desthel u çawa serukêt qeşa u karbedestê me ji nav birin u xaçdan. Belê hîvîa me ew bî u me hizir dikir, ku ew dê Îsraîlê rizgar kit, belê eve sê roje hatî ye xaçdan. Belê hindek jina emêt guhişandîn, ev jine hêş spêdê zî çûne ser gurrê u termê wî ne dîtin u vegerrane ve u gutine me dû frîşte dîtin dibêjin ‘Îsa yê sax e. U hindek ji ewêt digel me çûn u dîtin ew rast dibêjin, belê ew bi xu ne dît.” ‘Îsaî gute wan, “Ey tê ne gehîştînu. Hîn evêt bawerîa we bi hemî gutinê pêxembera kê: Ma ne divîa Mesîhî wa hemî nexuşîa bibînit u paşî biçit u bi gehite mezinatî ya xu?” U paşî bu wan hemî ruhinkir, her ji Musâî u hemî pêxembera bigire u ka çi behsê wî di hemî kitêba da hatîye kirin.

U paşî nêzikî wî gundî bîn, ew gundê her dû şagirda divîa biçinê, belê ‘Îsaî ji xu gute wan ez dê çime erdekî dîrtir. Belê wan hîvî jê kirin u gutinê bimîne def me her wexte rojê dê avabit, u êvar nêzik bî. ‘Îsa digel wan çû jur. U demê digel wan palqedaî, dest havête nanî u pîruz kir u şikand u da wan. Hingê çavêt wan vebîn u naskirin u paşî berze bî. Êk ji wan digute yê dî, “Ma ne dilê me di singê me da disut demê di rêkê da digel me diaxivit u bu me pertukêt pîruz ruhîn dikirin?” U paşî herhingê rabîn u vegerrhan Urşelîmê u her yazde u digel yê dî dîtin yê kubîn, u digutin, “Rast e Xudanê rabî u yê xu nîşa Sim’anî daî!” U ew çenda di rêkê da rîdaî u çawa naskirin demê nan şikandî gehandî ne wan.

‘Îsa Xu Nîşa Şagirdê xu Didit

Demê herdûka behsê hindê dikir, ‘Îsa bi xu di navbera wan da rawesta u gutê, “Aştî bu we bit! Belê ji tirsanda li def wan ew bî yê reşekê dibînin. U gute wan, “We çi ye, hîn têkçûn? U buçî hîn ne rehet in? Berê xu bidin dest u pêt min, ez bi xu me, dest bikine min u rastî bizanin. Hindî reşe çi goşt u hestî nîne weku hîn dibînin.” Demê ew çend gutî, dest u pêt xu nîşa wan da. Ewan hêştî ji keyf u guhişînê bawer ne dikir. Gute wan, “We li vêrê tiştêkê xwarnê heye?” Îna kerekê masîa birajtî danê u li ber çavêt wan wergirt u xwar. U paşî gutê,

“Eve ew gutine ya ku hêş ez dinav we da min gutî ye we ku divêt çi tiştê di desturê Musâî u pertukêt pêxembera u li ser min hatî nivîsîn bi cih bêt. U paşî bîr u hişê wan vekirin daku di pertukêt pîruz bigehin. U gute wan, “Husa ya hatî ye nivîsîn u husa divîa Mesîhî bêtin êşandin u roja sîê ji nav mirîa rabit. U bi navê wî ragehandina peşêmanî u lêburîna gunneha li hemî milleta bête kirin ku ji Urşelîmê dest pê bikitin. U bibine şahdin li ser van kar u bara. Eve ez dê wî tiştê babê min suz pê daî bu we hinêrim, belê li bajêrî bimînin heta hîn ji banê bilind ji hêzê bi çîl bikevin.”

Çûna ‘Îsayê Mesîhî bu Esmana

U paşî birne Bêrînê ji derveî bajêrî, u destêt xu bilind kirin u ew pîruz kirin. Demê ew pîruz




dikirin, ji wan veqeta u bu esmana hate bilind kirin. U paşî ‘Îsa peristin u bi keyfek mezin vegerrhane ve Urşelîmê, u berdewam diçûne peristgehê u pesina Xwidê dikir.

- Mizgînia Luqai 22:1-23, 39-54, 63-71; 23:1-5, 13-16, 18-56; 24:1-53


Peyvêt Kurdî Berambera Inglîzî:
Cejna Rabîna 'Îsayê Mesîh

Easter



BERAMBERÊ →

- 2 mirin
- 5 leşker
- 7 Pîlatis
- 9 bawer kirin, bawer bike
- 13 şîva dumahîkê
- 15 Hêridês
- 16 qurban
- 17 zilzal
- 20 xaçkirin
- 21 roja sîê
- 23 saxkirin
- 25 Cejna Derbazbînê
- 27 firîşte



XWARÊ ↓

- 1 Cihî
- 3 Cejna Rabîna 'Îsayê Mesîh
- 4 cidabîn
- 5 rizgarbîn
- 6 gunneh
- 8 dan destê neyara,
bide destê neyara
- 10 bê gunneh
- 11 nubedar
- 12 'Îsayê Mesîh
- 14 veşartin
- 18 zîaretê vale
- 19 diz
- 22 girtin, bigire
- 23 Roma
- 24 xaç
- 26 rizgarker
- 28 Xwidê
- 29 berxik




[Bersiva vê Beramberê li guvara meha bêdê ête belav kirin.]

ji meha burî: **Cejina Derbazbînê / Cejina Newrozê**



Passover and Nawroz



Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only



genc
teenager



Surîe
Syria



qelem
(ink) pen



rehetîa xu wergirtin, ... wergire
relax (v)



alîzî
tangled

Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only



difin mezin
big nose; proud



şelal
waterfall



birrîq u birîsî
lightning and thunder



têr xwarin, têr bixu
eat one's fill (v)



belaş
free (no cost)

Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only



kirêt
ugly



Dukan
Dukan (a river vacation area)



dest u til
hand and finger



derman xwarin, dermanê bixu
take medicine (v)



metat
stretchy (fabric)

Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only



sax
healthy



navbeyna
in between



rî u lêv
cheek and lips



sehî kirin, sehî bike
watch (TV, films) (v)



Newroz
March 21 (Kurdish independence day)

Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only



simbêl
mustache



Ordin
Jordan



şikestî
broken



ji xew rakirin, ji xew rake
wake up (v)



Remezana
Ramadan

Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only



lal
dumb / mute



li beramberî
across from



tepka befirê
snowball



serê xu şîştin, serê xu bişu
take a shower (v)



şîştin u veşîştin
wash and wash again (something is clean and in its place)

Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only



ze'îf
thin



Besira
Basra



kevin
old [things]



birin, bibe
take (v)



ava kanîe
spring (of water)

Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only



pîr
senior citizen (elderly person)



Çîn
China



dijwar
poisonous



xu vekêşan, xu vekêşe
stretch (v)



vekirî
unlocked

Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only



Ferhad u Şîrîn
Kurdish love story (like Romeo and Juliet)



li bin
under / below / beneath



ser nişîv kirî
upside down



sîar bîn, sîar be
ride (car, horse, boat) (v)



zîka
early

Fêrbîn u Fêrkin ya Zimanê

“Çîrokê Serhatî” ders yê fêrbîna zimanê ye bu dû yan pitir miruv. Dê harî karîa te kin da tu fêr bî u zîrek bî bu axiftinê u nivîsandinê u xwandinê. Ev ders xuş in!

Husa Çîrokê Serhatî bike:



Tiştê bike.

1. Serhatîkê ji perê bê hilbijêre yan tiştê dî bike.
2. Serhatî li gel mamostayê xu yan xwîndikarê(êt) xu bike.



Biaxive.

3. Behsa serhatîa xu bike. Bêje ve çi lê hatî. Pisîar bike, “Ewilî me çi kir? U paşî çi çê bî?”



Binvîse.

4. Çîrokê piç piç binvîse. Heker pêtivî ye, mamostayê zimanê dişê axiftina xwîndikarê dirist bike. Bêje mamostayê, “Ez dê nivîsim.”
Heker tu mamosta î u hemî xwîndikarê te ne şên baş binvîsin, rista binvîse li texta reş wextê xwîndikarê te dibêjine te çi binvîse.
Heker tu xwîndikarek î bi tinê fêr dibî, bu xu çîrokê binvîse.
5. Demê tu çîrokê dinivîsî, pisîar bike heker tu tiştêkê tê nagehî. Bêje, “Çawa? Ez tê ne gehestim.”



Bixwîne. Xeletîa xu dirist bike.

6. Heker te hemî nivîsî, xwîndikar pêtivî ye çîrokê bu mamostayê bixwîne ve. Hemî xeletîa dirist bike u carek dî binvîse. Bêje mamostayê, “Ez dê nuke bu te xwînim ve. Zehmet ne bit bêje min heker min xelet nivîsî.”



Binvîse.

7. Heker xwîndikar ne nivîsî ne bu xu, bila ew pêtivî ye çîrokê ji textê reş çap bikinc li ser perê xu binvîsin.



Bixwîne.

8. Xwîndikar carek dî çîrokê bi dengê bilind bixwînit. Pêtivî ye mamosta axiftina wan dirist bikit.
9. Mamosta hindek peyv ji çîrokê dibêjit u xwîndikar nîşan dikit. Mamosta dibêjit, “Ka <dihî> [peyvek li çîrokê].” yan “Ya <dihî> nîşa min bide.” Xwîndikar wê peyvê nîşa mamostayê didit.

ABC Pît bike.

10. Xwîndikar çîrokê seş nakin. Mamosta hindek peyv ji çîrokê dibêjit u xwîndikar wê peyvê dinivîsit da fêrî pîtkirinê bibit. Piştî 5-10 peyv nivîsî ne, xwîndikar çîrokê seş dikit u pîtkirna xu dirist dikit. Pêtivî ye hemî xeletîa xu dirist bikit u carek dî binvîsit.



Bixwîne.



Binvîse.



Biaxive.

11. Carek dî xwîndikar çîrokê bu hevalekê xu dinivîsit. U heker divêt, dişê carek dî hemî çîrokê binvîsit. U bê xwandin ew dişê çîrokê bêjit.

© 2007 by Şîrîn

Xwarin

- Çayê yan qehweî çêke. Pêk ve vexwe.
- Pêk ve zad bixwe.
- Herre seyranê di gel hevalêt xu.
- Sendewiç yan piskuêt çêke.
- Kêkekê yan şerbeteka fêqîê pêk ve çêke.
- Seyranekê bu xu deynin.
- Cihê xwarnê hazir bike.
- Herrin xwaringehê u fravînê pêk ve bixwin.
- Herrin çayêxanê yan gazînûê.

Tiştê Kaşezekê

- Rismî çêkin yan reng bikin.
- “Texmînê Bike!” yarî bikin.
- Rismê xêzana çêke u navêt hemîa binvîse.
- Firukêt kaşezê çêke u bifirre.
- Tarîxê teybet li riznamê nîşan bike u behsa bike.
- Çîrokekê bêje u rismê çîrokê bihijmêre.
- Mektubekê bu hevalê xu binvîse.
- Tiştêkê bu Kurdî yan Ingîzî tercime bike.

Keskatî

- Pîa herrin.
- Hecku tu birînekê der bikî.
- Hecku tu dixur î. Behsa nesaxîa hevala xu bike.
- Herrin cihê seyranê u risma bigirin.
- Keskatîa biçînin.

Bajêrr

- Hecku tu pareêt xu bikî di banqê da.
- Hecku tu pareêt xu serif bikî.
- Hecku tu bu şulekê nî lê pirsî.
- Hecku tu diçî teksîê.
- Cilkêt biçîk bizivirînin.
- Pêk ve herrin mala cîranê xu.
- Herrin bu xu bajêrrî bibînin. Risma bigirin.
- Herrin methêfê. Risma bigirin.
- Hecku tu pirça êkê biqosînî.
- Şeh kin xerrîta bajêrrî u fêr bikin hîn çawa dê çin hindek ciha.
- Şeh kin xerrîta Emrike u hilbijêrin hindek bajêrra da biçin. Hilbijêrin hîn dê çin kîşk rêkê.
- Pêk ve herrin dawetê.

Cilik

- Cilkêt xu lêk bide bi demê salê, şikilê, rengê
- Qemselê yan pêlava yan ... bikin ber xu. Bêxin.
- Yarî bikin: Biha yêt wan texmîn bike.
- Pisiara hevalêt xu yê bîanî, “Cilkêt dawetê nîşa min bide.”

Paqijkirin

- Pêk ve mala xu paqij bikin.
- Amana bişun. Deynin cihê wan.
- Harî karîa hevalê xu bike li paqijkirna biharê.
- Duhinê timbêla xu biguhurrin.
- Fehsa tiştê duhinî u tayerêt timbêla xu bikin.
- Cerrîfkê kehrebê paqij bikin u pencerka bişun.
- Timbêla xu bişun.

Yarî

- Yarıa biçîka bike.
- Bêje, “Min tiştêkê şîn dît.” Hevalê te dibêjite te ew çî ye.
- Kukanê yan yarîek dî bike.
- Zarî bike (şulê, çîrokê ...). Hevalê te dibêjite te ew çî ye.
- Qedemê yan taîre yan tepka destî lê bide.
- Pezila bêxin pêk ve.

Dikan

- Pêk ve herrin dikanê. Hindek tiştê bikirrin.
- Pêk ve herrin sîkê xwarinê.
- Pêk ve dîarîekê bu cîranê xu yan biçîkêt birayê xu bikirrin.
- Pêk ve herrin sîkê gundî.
- Pêk ve hindek cilka bikirrin.
- Pêk ve hindek tiştê kehrebê bikirrin.

Çêkirin



































- Xemilandinekê cejinê çêkin.
- Dijdaşa yan balîfka yan melîtker kin.
- Balîfka yan betenîa yan xewlîka bidrîn.
- Guhartina gula çêkin.
- Xanîê xwarina teyra çêkin.
- Komedîna kitêba yan mekteba çêkin.
- Komedîna pêlava yan cihê l'abika çêkin.

Elif Bê

| | | | | | |
|----|---------|---|----------|-------|----------------|
| a | ا ا ا ا | j | ژ ژ ژ ژ | t | ت ت ت ت |
| b | ب ب ب ب | k | ك ك ك ك | u | و ئو و و |
| c | ج ج ج ج | l | ل ل ل ل | û | وو ئوو ووو ووو |
| ç | چ چ چ چ | l | ل ل ل ل | wu, û | وو |
| d | د د د د | m | م م م م | v | ڤڤ ڤڤ |
| e | ه ه ه ه | n | ن ن ن ن | w | وو و و و و |
| ê | ئ ئ ئ ئ | o | و ئو و و | x | خ خ خ خ |
| f | ف ف ف ف | p | پ پ پ پ | ÿ | غ غ غ غ |
| g | گ گ گ گ | q | ق ق ق ق | y | ی ی ی ی |
| h | ه ه ه ه | r | ر ر ر ر | Z | ز ز ز ز |
| ḥ | ح ح ح ح | r | ر ر ر ر | , | ع ع ع ع |
| i | ئ ئ | S | س س س س | | |
| î | ی ئ ی ی | Ş | ش ش ش ش | | |

© by Şîrîn 2003

Elif Bê

| | | | | | | | | |
|------|--------|---|------|----------|---|------|----------|---|
| ' | ‘Îraq |  | I, I | Istralîe |  | S, s | sister |  |
| A, a | agir |  | Î, î | îprax |  | Ş, ş | şeh |  |
| B, b | berx |  | J, j | jijî |  | T, t | temate |  |
| C, c | camî |  | K, k | kiras |  | U, u | Urdin |  |
| Ç, ç | çav |  | L, l | leymîn |  | Û, û | ûtêl |  |
| D, d | dersuk |  | M, m | meymînk |  | V, v | vexwarin |  |
| E, e | enik |  | N, n | nubedar |  | W, w | werîs |  |
| Ê, ê | êxtîar |  | O, o | ode |  | X, x | xîar |  |
| F, f | fêqî |  | P, p | paîsigil |  | Û, Û | Ûarîfk |  |
| G, g | gul |  | Q, q | qelew |  | Y, y | Yunan |  |
| H, h | heyv |  | R, r | rîvî |  | Z, z | zirnna |  |
| Û, Û | Ûêştir |  | | | | | | |

‘Îsa yê Rizgare

Ev wêne dirist kirin ji laê Awat, Hewlêr, 2007.

